# Berxwedana kurdên Îranê

Konjekturên siyasî yên navneteweyî ji ber ku gelek hêmanên dîktatoriyê xwedî bikin hebûn, Muhammed Riza Şah, li Îranê jî li derve jî bi hêsanî tevdigeriya û pêwendiyên gelek fireh bi derdora xwe re datanî Piştî herifîna Komara Mehabadê, beşên ku xwestin di nav kurdan de têkoşîna rêxistinî bi rê ve bibin, bi gelemperî di nav pêkhatin û komîteya komunîst a kurd de cih girtin. Bi derxistina rojname û kovaran, hewl dan ku ruhê berxwedana têkoşîna neteweyî ya kurd li ser piyan bihêlin. Ji aliyê din ve kesên ku di damezirandina Mehabadê de cih girtin û ji êrîşên piştî pelişînê xilas bûn an jî xwestin seravaniya ku Mehabadê afirandibû bidomînin, di nav Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê de hebûna xwe domand. A rast piştî pelişîna Mehabadê, PDK bi awayê fermî diyar kiribû ku hebûna xwe bi dawî kiriye. Lê di kirinê de hebûna xwe didomand. Ev kurdên ku pêşengiya civakparêziyê dipejirand, di cihê têkoşîna bi çekdarî de hewl didan ku bi navbeynkariya weşanên cuda, dengê xwe bidin bihîstin. Di sala 1948□an de li Mehabad û derdora wê, hinek weşan bi dizî hatin weşandin û belavkirin. Lê ev rewş zêde nedomiya: Azîz Yûsûfê ku di nav kurdên têkoşer de bal dikişand, hate girtin. Bi vê girtinê re jî derket holê ku bi van çalakiyên bi vî rengî birêvebirin, ne hêsan e.

ZIMANÊ KURDÎ QEDEXE BÛ

Şah Muhammed Riza û Muhammed Musaddik, ji ber polîtîkayên ku li hember kurdan pêk dihatin, di nav kurdan de bi tu awayî nehatin hezkirin. Wekî di referandûma ku di 13□ê tebaxa sala 1953□yan de bi pêwendiyên Şah ve girêdayî hat kirin de, li bajarê Mehabadê ji pênc hezar dengan, tenê du heb jê ji bo Şah derdikevin. Ji bo hemû herêmên Kurdistanê heman ast nayê derbirîn lê li cihên ku hestên kurdîtiyê hebûn, nerazîbûnên ku ji Rêveberiya Îranê dihat jiyîn, wekî hev bûn.
Kurdan ji Şah û Rêveberiya Îranê hez nekir. Lê Şah û Rêveberiya Îranê jî ji kurdan hez nedikir. Ji ber ku hez nedikirin jî wekî gel, hewl didan ku dawî li hebûna kurdan bînin. Rêveberiya Îranê, ji bo ku bigihîje vê armancê, rêbazên cuda bi kar dianîn. A rast Hikûmeta Îranê her tim kurdan wekî □Îraniyên saf□ pênase kiriye. Lê pênasekirina kurdan a □Îraniyên saf□ nebûye asteng ku ziman û çanda kurdan bê qedexekirin. Di sala 1950□yî de li dibistanên Îranê axaftina bi kurdî û lixwekirina cil û bergên kurdî, qedexe bûn. Qala kurdî nedihat kirin.
Dema ku dihat qalkirin jî wekî zaravayekî farisî derbas dibû. Ji bo kurdî, gotina □ziman□ piştî salên 1950□yî li Îranê wekî □dabeşkerî û îxaneta welat□ di hate dîtin. Li hember pergaleke wiha, kurd jî vala nesekinîn û ketin nav hinek hewldanan. Çiqas rejîma Îranê pêkutiyên xwe zêde dikirin, mêlbûna rêxistinbûnên îlegal di nav kurdan de hîn zêdetir belav dibûn. Piştî sala 1950□yî ev mêlbûn, bersiva xwe ya rêxistinî jî dît.

TEVGER TÊK ÇÛ

Di pêvajoya serokwezîriya Muhammed Musaddik a sala 1951□yî de PDK hemleyeke cidî ya rêxistinî da destpêkirin. Dest bi qeydkirina endamên nû û birêxistina fealiyetên propagandayê kirin. Polîtîkayên dîktatoriyê yên ku wekî dirî di birînên encama pelişîna Komara Mehabadê de diçûn, bûn sedem ku bi lez ber bi PDK□yê ve mêldar bibin. Wisa bû ku piştî xebateke çend mehan, di rêbendana sala 1952□yan de di hilbijartinên ji bo 17□emîn Meclisa Îranê de berendamê PDK□ê bi ferqeke mezin bi ser ket. Lê Dewleta Îranê encamên hilbijartinê derbasdar nehesibandin û mirovekî olî yê şiî wekî rêveber şand herêmê. Kurdên sunnî vê nêzîkahiyê li hember xwe wekî heqaret pejirand û li dora polîtîkayên dijberî Şah, hîn zêdetir bi hev girtin.Mêldarî û piştgiriya kurdan a rêxistinên li dijî rejîmê, bû sedem ku Dewleta Îranê hinek din jî pêkutiyên xwe zêde bike. Di sala 1952□yan de gundên Eşîra Bûkanê, li hember pêkutiyên hevkarên feodal û polîsan a hevkar, rabûn ser piyan.
Ev tevgera gundiyan a ku di pêşengiya PDK□ê de pêk hat, bi lez li herêmên Bûkan û Mehabadê belav bû. Şahê Îranê, ev pêşveçûn ji xwe re wek xetereyek mezin dît û fermana çewisandina serhildanê da. Tevgera Gundiyan a Bûkanê, jiber bê amedakariyê li hember êrîşên tund ên artêşê, nikarî bû zêde berxwe bide û têk çû.

KONGREYA PDK□Ê

Di heman pêvajoyê de serhildana Eşîra Cawanrûdî (Canra) ya li ser sînorê Îran-Iraqê didomiya. Piştî dagirkeriya Sovyetan a sala 1941□ê, Eşîra Cawanrûdî ya ku otorîteya herêma xwe kiribû destê xwe, tu otorîteyên ku ji derve dihatin nepejirand û □xweserî□ya xwe parast. Ev rewş ji sala 1948□an heta sala 1956□an domiya. Di vê dîrokê de Artêşa Îranê, hinek eşîrên kurd ên wekî Bahtiyarî û Kaşkaî girtibûn pişt xwe, kurdên ku berê bi hêza xwe nikaribû têk bibe, bi destê eşîrên kurd têk birin. Eşîra Cawanrudî (Canro) keliha dawîn a kurdan bû ku karibû xweser bimîne.Ew jî di 4□ê sibata sala 1956□an de têk çû.

Di sala 1958□an de piştî derbeya ku li Iraqê çêbû, Mustafa Barzaniyê ku vegeriya Kurdistanê, ji bo ku PDK□yên Îran û Iraqê di bin banekî de kom bike, ket nav liv û tevgerê. Dewleta Îranê ya ku ji vê hewldanê haydar bû, operasyoneke mezin li dar xist û komîteya navendî jî di nav de 250 PDK□iyan girtin. Ev pêşveçûn digel ku di nav kurdên Îranê de pirsgirêka rêbertiyê derxist holê, karê Mustafa Barzanî jî hêsan kir. Hem PDK□a Îranê, hem PDK□a Iraqê ket bin venêrîna Barzanî.
Her çiqas çend sal pirsgirêk hatibin jiyîn jî ev rewş domiya.Di sala 1964□an de li Kongreya 2. a ku PDK□ya Iraqê li Kela Dizê pêk anî de dema ku sûcdariyên □di pêvajoya pelişîna Mehabadê de helwesta Qadî Mihemed wek îxanet□ hat bilêvkirin, di navbera herdu PDK□yi yan de sarbûnî û ji hev dûrbûniyek da destpêkirin.

## KOMÎTEYA ŞOREŞGER

Di nav heman salê de Mûstafa Barzanî □beranberî piştgirîdayîna têkoşîna li Iraqê□ bi Dewleta Îranê re hevdîtin pêk anîn û di ser PDK□a Îranê re bazariyan kirin. Mûstaf
Barzanî dixwest ku PDK□a Îranê berxwedana xwe ya li hember Şahê Îranê biqedîne. Li hember vê yekê dê Dewleta Îranê alîkariya Barzanî bikira. Ev nêzîkahî, di navbera kurdên Îranê de rê li ber hêrseke mezin û li hember Barzanî nîşandana bertekan vekir. Komeke şoreşger a ku di nav de Abdurrahman Qasim (Qasimlo) jî hebû; Li hember helwesta Barzanî ya ku kurdên Îranê ji bo berjewendiyên xwe dike bazariyê, biryara □li hember Şah têkoşîn□ dan destpêkirin.
□Komîteya Şoreşger□ a ku piraniya wê ji şoreşgerên ciwan û bêcerebe pêk dihat, di sala 1967□an de li hember rejîma Şah, dest bi têkoşîna çekdarî kir. Di fikir û ramana wan de di çiyayên Kurdistanê de bi çalakiyên çekdariyê li hember Artêşa Îranê bi ser bikevin. Lê ji ber ku bê cerebe bûn, di nav salekê de tasfiye bûn. Ji ber ku piştgiriya ku li bendê bûn ji gel nedîtin û gel têr piştgirî neda wan. Lewre nikaribûn li hember êrîşên Artêşa Îranê bisekinin û digel ku gelekan jiyana xwe ji dest da, yên mayî jî ji hêla Artêşa Îranê ve hatin girtin.

## ÎXANETA BARZANÎ

Di vê kirina radîkal a PDK□a Îranê ku bi êşeke pir mezin bi dawî bû de rista Mustafa Barzanî gelek girîng bû. Dema ku di 1967 an de şer dest pê kir Mustafa Barzanî zordariyê li PDK□iyên Îraniyan kir ku ji axên wî derkevin û biçin Îranê. Bi vî awayî PDK Îran qadên ku li hember êrîşên Artêşa Îranê li ber xwe bide, teng kirin. Dîsa ji rêberên komîteyê Suleyman Muînî û nêzîkî 40 PDK□î Îraniyan kuştin û cenazeyên wan radestî Dewleta Îranê kirin.Tunebûna wan a arasên rêxistinî û leşkerî, tenê li herêmên Mehabad û Baneserdeştê ketina tengasiyê, tunebûna stratejiyeke ku serkeftinê bîne, hinek ji wan sedemên bingehîn in ku têkçûnê afirandine. Lê îxaneta Barzanî ket pêşiya hemûyan û bû sedem ku hem di PDK□a Îranê de hem di kurdên Îranê de antî-Barzanîtiyek pêşve here. Îxaneta Barzanî, ne sedema bingehîn a têkçûnê bû. Lê xençerkirina PDK□iyan a ji destê Barzanî, li ser kurdan bandoreke mezin kir.

## XWE NÊZÎ REJÎMÊ KIRIN

Kurdên Îranê xwe nêzî rejîmê kirin. Kurdên Îranê, bi armanca ku bikaribin xwe derbibirin, her tim xwe nêzî hêz û rêxistinên muhalîfên rejîmê kirin. Sedema vê yekê gelek hêsan e. Rêveberî û serdestan, polîtîkayên li hember kurdan diafirandin. Kesên ku li hember kurdîtiyê hestên wan nemabûn, ji vê rewşê acizî dikirin û xwe nêzî rêveberiyên serdestan dikirin. Piştî ku Muhammed Riza Şah, Sovyet û artêşên îngilîzan ji Îranê vekişiyan, pirsgirêkên Azerbaycan û Mehabadê hatibûn çareserkirin.
Muhammed Riza Şah, ji vê rewşê hêz girtibû û bûbû dîktator. Konjektorên siyasî yên navneteweyî jî ji ber ku gelek hêmanên dîktatoriyê xwedî bikin hebûn, Muhammed Riza Şah, li hundir jî li derve jî bi hêsanî tevdigeriya. Muhammed Riza Şah, ji bo ku dîktatoriya xwe bimeşîne, xwe bi pêwendiyên gelek fireh dorpêç kiribû.
Wekî mînak; di sala 1950□î de ji bo serokwezîriyê General Razmara peywirdar kir û Razmara wekî kesê ku aramiya Îranê pêk bîne, diyar kir. Lê Razmara, di polîtîkayên ku bi rê ve bir de bi ser neket û di sala 1951□ê de hat kuştin. Di gulana sala 1951□ê de Dr. Muhammed Musaddik anîn cihê wî. Piştî du salan, bi derbeya ku di tebaxa sala 1953□yan de hat kirin re Musaddik hat tasfiyekirin... (Dê bidome)

Dema kurdan di metna ku pêşkêşî referandûmê hat kirin de dît ku xaleke der barê mafên wan de tuneye, fêm kirin ku di fikarên xwe de mafdar in û bi azeriyan re referandûmê boykot kirin

Komîteya Şoreşger, tevî ku di şerê yekemîn ê ku di sala 1967'an de têk çû jî, biryar da ku têkoşîna çekdarî bidomîne. Di kongreya 3. a partiyê de ku di sala 1972'yan de hat lidarxistin û Abdurrahman Qasimlo wekî sekreterê giştî yê PDKÎ'yê hat hilbijartin de bi şîara " ji bo Îranê demokrasî, ji bo Kurdistanê xweserî" hat îlankirin ku dê dest bi têkoşîna çekdarî bê kirin. PDKÎ, ji ber sedema têkçûnên ku jiya û gelek kadroyên wê tasfiye bûn, negihîşt beşên fireh ên gel, nikaribû wan birêxistin bike. Lê ji bo ku kurd wekî hêzeke siyasî hebûna xwe ya li Îranê bidomînin, risteke girîng lîst. Komên Îslamî û Marksîst ên li ku Îranê li hember rejîma Şah têdikoşiyan, dest bi nasîna PDKÎ'yê kirin û têkiliyên xwe pêşve birin. Fedaiyên gel û mucahîtên îslamê, bûn rêxistinên ku herî zêde têkilî bi wan re hatin danîn. PDKÎ, bi hêvî bû ku di ser encamên van têkiliyên erênî re ji aliyê Îranê ve jî piştgiriyê bigire. Wisa difikirî ku heke beşeke gelê Îranê di mijara dayîna mafên kurdan de bikeve nav nêzîkahiyeke erênî, dê kurd hîn hêsantir bigihîjin mafên xwe.

## PEYMANA CEZAYÎRÊ

Di heman pêvajoyê de rêxistina komalayê jî li çend herêmên Kurdistanê xwepêşandanên bi tevlibûnên gelek dorfireh ên protestoyî pêk anîn. Ev xwepêşandan jî li çalakiyên gelek dorfireh vegeriyan. Dirûşmên bingehîn ên komalayê; "Guherîna rejîma Şah û azadkirina mehkûmên siyasî bûn. Di dawiya sala 1978'an de xwepêşandan gihîştin armanca xwe û rêberê PDKÎ'yê ku 23 sal bûn di girtîgehê de bû, hat berdan. Yên ku ji girtîgehê derketin, bêyî ku bisekinin, Mehabadê wekî navend diyar kir û dest bi rêxistinbûnê kir. Hinek kurdên ku berê reviyabûn Ewropayê, vegeriyan û li pişt kadroyên PDKÎ'yê dest bi meşê kirin. Mehabad ji nû ve bûbû navenda siyasî ya kurdan. Piştî sala 1978'an, pêleke şoreşê ya ku gelemperiya Îranê dorpêç dikir, çêbû. Vê pêvajoya şoreşê, li Kurdistana ku ji mêj ve li hember rejîma Şah û polîtîkayên ku pêk dianîn bi hêrs bû jî deng veda. Peymana Cezayîr a ku di sala 1975'an de hat destnîşankirin û di mijara felaketên ku peyre hatin serê kurdan de rista Dewleta Îranê ya ku neyînî lîst, tevli hêrsa heyî bûbû. Her wiha dema ku Şah di sala 1978'an de qels bû, kurdan bi lezgînî, bi desteserkirina garnîzonên Îranê çek bi dest xistin û xwe bi çek kirin û wekî hêzeke girîng li Kurdistanê bi cih bûn.

## DAXWAZAN RED KIRIN

Hikûmeta Tahranê, pênaseya erdnîgariya Kurdistanê ya ku derket pêş, red kir û pêşniyazeke dijber pêşkêş kir: Ji bo rêveberiyên herêmî peywirdarkirina pêwendîdarên kurd, kêmbikaranîna kurdan û mafê zimanê zikmakî, mafên kurdan ên ku dê di makezagonê de bikevin nav mafên kêmaniyan. Hem daxwazên ku kurdan derxistibû pêş, hem pêşniyaza hikûmetê, pêşkêşî Humeynî hatin kirin. Humeynî, daxwaz û pêşniyaza dijber a hikûmetê veto kir. Her tişt car din ket nederê û hema di pey re jî pevçûn dest pê kirin. Li ser banga Şêx Îzedîn ê ku mirovekî navdar ê olê bû û di nav kurdan de gelek nirxdar bû, agirbest pêk hat. Lê piştî du hefteyan ew jî xira bû. PDKÎ, komala û bi giştî kurdan jî hewl didan ku amadekariyên xwe baş bikin. Her wiha li gorî berê, gelek bi hêz bûn. Ji ber vê yekê jî di payîza sala 1979'an de serkeftinên cidî bi dest xistin. Mehabad û hin herêmên derdora wê, ji destên Pastaran girtin.

PROTESTOKIRINA QANÛNÊ

Hikûmeta Tahranê ya ku xetereyên di pêvajoya şerê Îran û Iraqê de li ber çav girtin, her çiqas ji bo vekirina riyên lîberal hewl da jî pêvajo bi pergalkirineke ku li dijî kurdan derkeve, bi encam nebû. Sedema vê yekê ya bingehîn, nexwestina tavîzdayînê ya Humeynî û Mollayan ên ku hêzên esas ên Îranê bûn. Di çepera kurdan de jî PDKÎ''yê, vê pêvajoyê baş bi rê ve nebir. Ji ber ku PDKÎ, ne xwedî wê hêzê bû ku hemû kurdan araste bike. PDKÎ'ya Barzaniyan a ku li başûrê Kurdistanê îtaatkirina Hikûmeta Îranê rast didît û rastiya ramana Kurdistaneke Xweser nediparast, bandora xwe danîbû û di girtina beşeke kurdan a aliyê xwe de bi ser ketibû. Li başûrê Îranê jî Rêxistina Komala ya ku nûnertiya PDKÎ'yan a kurdan nedipejirand, bandora xwe danîbû û beşeke kurdan jî wê kişandibû aliyê xwe. PDKÎ, neçar mabû ku bi herdu rêxistinên li dijî xwe re têbikoşe. Dema ku wisa dibû jî parçebûn kûrtir dibû. Parçebûna Rojhilatê Kurdistanê ya di nav ewqas dijberiyan de bû sedem ku pêvajoya hevdîtinên bi Hikûmeta Tahranê re baş bi rê ve neçin. Dema ku hem nêzîkahiya Humeynî, hem nêzîkahiya kurdan bû yek, pêvajo mehkûmê biserneketinê bû. Divê mirov li vê derê kirpandineke taybet bike. Ji kurdên Îranê beşek şiî, beşek sunî bûn. Bertekên şiî û suniyan a li hember rêveberiyên Humeynî cuda bûn. Kurdên sunî, di sermaweza sala 1979'an de taslaka qanûna protesto kir û tevli referandûmê nebûn, kurdên şiî yên Kirmanşah û derdora wê ji bo makezagonê deng bi kar anîn. Her wiha îlan kir ku li aliyê Şoreşa Şiî-Îslamê ne û cihê wan li cem hikûmetê ye. Kurdên şiî û sunî yên ku di eniyên ewqas cuda de cih girtin, pir dem derbas nebû, dest bi pevçûnê kir. Yek ji sedemên girîng ên ku PDKÎ pêvajoyê baş bi rê ve nebir, ev bû.

ŞERÊ GERÎLA DEST PÊ KIR

Piştî ku hevdîtin bi sedemên ku hatin diyarkirin vala derketin, di havîna sala 1980'yî de şerekî gerîla dest pê kir. Kurdistan, wekî navenda şer hat diyarkirin û rêxistinên wekî PDKÎ, Komala Fedaiyên Gel û Mucahîtên gel li çiyayên Kurdistanê bi cih bûn. PDKÎ, ji bo ku di navbera van rêxistinan de lihevkirinê pêk bîne û eniyeke hîn bihêztir biafirîne, gelek hewl da lê bi ser neket. Nemaze, pir dem derbas nebû, dema ku di mijara "divêtiya diyarkirina kîjan stratejiya kurdan" de nîqaş dihatin birêvebirin, rêxistin bû du beş. Di vê pêvajoya ku Artêşa Îranê xwe li gorî şerê bi Iraqê re bi cih dikir de li Kurdistanê valahiyeke girîng derket holê. Rêxistinên PDKÎ û Komala, ji vê nêvengê sûd wergirt, dibistan vekirin, li gund û bajaran meclisên xwe ava kirin. Kurdên ku demekê li Kurdistanê bi serê xwe man, zanibûn ku Artêşa Îranê çawa derfet bibîne, dê êrîş bike. Li gorî vê dibetiyê amadekariyên xwe dikirin.

Di heman pêvajoyê de Dr. Abdurrahman Qasimlo pêşniyaza "Heke Hikûmeta Tahranê mafên kurdan nas bike, bi çekên ku di destên wan de ne dê bikaribin li hember Iraqê şer bikin." pêşkêş kir. Lê Hikûmeta Tahranê bersiv neda vê pêşniyazê. Ev bêdengî, elametê êrîşê bû...

Ji Bo Îranê Demokrasî Ji bo Kurdistanê Xweserî

Qala xebatên " bi sînor" ên ku PDKÎ'yê piştî salên 1970'yî kirin û nikaribûn xwe bigihînin gel, kiribû. Lê bi sînor be jî domandina doza kurd a neteweyî, fedekariya mirovan a di asta ku di vê riyê de xwe feda bikin, yek ji sedemên bingehîn ên ku di sala 1978'an de xwe zû komî ser hev bikin. Divê mirov vê yekê jî bikirpîne. Kurd, bi têkoşîna muhalefeta Îranê ya li hember Şahê Îranê û di sala 1979' an de bi pêkhatina Şoreşa Îslamê, tevkariya ku dê ji eniya kurdan bê pêşkêşkirin, pêşkêş kir. Ji pêkhatina şoreşa îslamê jî kêfxweş bûn. Sedema vê kêfxweşiyê, ne damezirandina dewleteke şiî ya misilmanan bû. Sedema kêfxweşiyê; hêviyên ku dê rêveberiyek adil çêbibe û hinek mafên kurdan bên naskirin bû. Ev hewaya xweşbînî zêde nedomiya. Sê hefte piştî ku Ayetullah Humeynî hat serî, nêzî Baneyê di navbera hêzên hikûmetê û kurdan de pevçûnên tund

derketin. Wekî ku di dirûşmên xwe de “Ji bo Îranê demokrasî, ji bo Kurdistanê xweserî” dianîn ziman, dixwestin ku bibin xwedî gotin. Rejîma ku nû hatibû damezirandin jî ji aliyê bihêzkirina otorîteya navendî bû. Ji ber vê yekê jî zêde riyên lihevkirinê tunebûn û pevçûn roj bi roj zêde bûn û domiyan. Di adara sala 1979’an de kurdan diyar kir ku dê komara îslamê nas bikin û beranberî vê yekê jî xwestin ku hinek daxwazên wan werin pejirandin. Di bingeha daxwazên ku bi awayê fermî pêşkêşî Hikûmeta Tahranê hatin kirin de mijara “Li Îraneke federal wekî yekîneyeke rêveberiyê, xweseriya Kurdistanê” hebû. Her wiha Kurdistana ku xweseriya wê dihat xwestin, mijarên ku dê kîjan herêman bigire nav xwe, sînor li ku derê dest pê dikin û li ku derê diqedin jî pêşkêşî hikûmetê hatin kirin.

## Mafên Kurdan Tune Ne

Humeynî, asta gihîştina bûyeran ji pêşî ve dît, agirbesta dualî û hevdîtina bi serhildêran re pejirand. Humeynî, pêşniyaza “ venêrîna aboriya eyaletê, hin venêrînên qadên siyasî, civakî û çandî” kir. Kurdan jî dîsa daxwazên xwe dubare kirin û xwestin ku “xweserî” bi qanûnan bikeve bin ewlehiyê. A rast, pêşniyaza Humeynî, pêşniyazeke ku bê pejirandin bû. Lê kurdên ku berê gelek car hatin xapandin, bi weadên devkî yan jî bi pergalên derbasdar ewle nedibûn. Dixwestin ku mafên ji bo wan bên dayîn, bi têkiliyên hiqûqî û qanûnan bikevin ewlehiyê. Hevdîtin bi dawî bûn. Piştî demekê, qanûnên ku nû hatin amadekirin, pêşkêşî referandûmê hatin kirin. De- ma kurdan di metna ku pêşkêşî referandûmê hat kirin de dît ku xaleke der barê mafên wan de tune ye, fêm kirin ku di fikarên xwe de mafdar in û bi azeriyan re referandûmê boykot kirin. Piştî boykotê, pevçûn car din zêde bûn. Li Sîne, Pawa, Nawsûd, Cawanrûd, Pîranşar û Ûşanviyeyê pevçûnên dijwar qewimîn. Yekîneyên Artêşa Îranê navendên bajar kirin bin destên xwe lê beşên bejahî ketin bin venêrîna kurdan. Di sala 1980’yî de şerê navbera Îran û Iraqê derket.

www.azadiyawelat.com